
Ferit Edgü

# Dengê Doyê

Werger: Cemil Oguz

Rêza Pirtûkên Kurdî - 12

Çîrok



EVRENSEL BASIM YAYIN



EVRENSEL
BASIM YAYIN

Ferit Edgü



# DENGÊ DOYÊ



Werger: Cemil Oguz

Çîrok

DOĞA BASIN YAYIN
Dağıtım Ticaret Limited Şirketi
Tarlabaşı Blv. Kamerhatun Mah. Alhatun Sk. No: 25 Beyoğlu / İstanbul
T: 0212 255 25 46 F: 0212 255 25 87
www.evrenselbasim.com - info@evrenselbasim.com

Evrensel Basım Yayın **452**

Rêza Pirtûkên Kurdî **12**

**Ferit Edgü: Dengê Doyê**

Werger: **Cemil Oguz**

Redaksiyon:
Kurmancî: **Dawûd Rêbiwar, Çiya Mazî**
Kirmanckî: **Nurullah Burçînî**

Dîzayna Bergê: **Savaş Çekiç**

Amadekirina Bergê: **Devrim Koçlan**

ISBN **978-605-4156-94-8**

© Evrensel Basım Yayın **2011** - Sertifika No **11015**

Çapa Yekemîn Kewçêr 2011

Çap: Ezgi Matbaası Sertifika No: 12142
Sanayi Caddesi Altay Sokak No: 10 Çobançeşme - Yenibosna / İstanbul
T: 02124522302 - 6549418 - ezgimatbaa@mynet.com - www.ezgimatbaa.net



# DENGÊ DOYÊ



NAVEROK

## I Çîrokên Mirinê


Dengê Doyê ..... 11
Bendewar ..... 14
Kîteya Dawî ..... 15
Nav ..... 17
Hewar ..... 18
Bêrehm ..... 19
Ji Arşîvê ..... 20
Winda ..... 21
Xewn ..... 22
Soberînera Dawî ..... 23
Peyîn ..... 25
Rawestgeh ..... 26
Yê Dimeşe ..... 27
Ketin ..... 28
Gor ..... 29
Benîadem ..... 30
Mehsûm ..... 31
Bêhewar ..... 32
Cemıdîn ..... 33


## II Çîrokên Jiyanê


Ziman ..... 37
Kurte ..... 38
Bi Sıûd ..... 39
Sirgûniyeke Ecêb ..... 40
Dijraber ..... 41
Kûçik ..... 42
Jixweber ..... 43
Kêm Zêde ..... 45
Rê ..... 46
Bes ..... 47
Malbateke Ecêb ..... 48
Bezîner ..... 49
Belkî ..... 50
Bêdengî ..... 51
Îtîraf ..... 52
Axaftin ..... 53
Çîrokek ..... 54

III Çîrokên Eletewş


Şop ..... 57
Siûd ..... 58
Çol ..... 59
Kilîd ..... 60
Remayiş ..... 61
Teyşanî ..... 62
Veqetîn ..... 63
Rastlêhatin ..... 64
Destpêk ..... 65
Sohbet ..... 66
Bi Taybetî ..... 67
Li Dû ..... 68
Taloqkerdiş ..... 69
Qet ..... 70
Çile ..... 71
Nifir ..... 72
Ronahî ..... 73
Roj ..... 74
Cot ..... 75
Kaf ..... 76
Bêfêde ..... 77
Wêrek ..... 78
Bêçare ..... 79


IV Hatin û Çûyîn


Hatin û Çûyîn ..... 83

# I

# ÇÎROKÊN MIRINÊ

*"Bila ne zere, ne jî mîsqal bimîne"*
Atar (Sedsala XIII'an)

*"Dirûv û mirinên min, bi qasî ku neyên jimartin bûn."*
J.L.Borges



# DENGÊ DOYÊ

*Ji bo Semîha Berksoy ku rojekê ji min re got,*
*"Min dengê Do derxist, min mirin têk bir."*

Odeya nexweşxaneyê ya bi bêhna klorê.

Di nav çarşefên sipî de zilamekî extiyar. Porê çîl sipî. Çavên şîn ku biriqîna xwe winda nekirine. Rûyekî çilmisî.

Pîrejin li ser pêçiyên xwe dimeşe, tê ber karyoleyê. Maçekê tam li nava eniya nexweş dide.

Çawa ku lêvên jinê li eniyê dikevin zilamê extiyar û jin bi hev re dibişirin.

Zilamê extiyar dibêje: Tu hatî ha!

Pîrejin dibêje: Ma ez ê çawa nehatama!

Zilamê extiyar destên xwe yên hestî zirav û tilî dirêj di bin çarşefê re derdixe. Destê rastê yê jinikê digire nava her du destên xwe.

Çav li çav in.

Zilamê extiyar dibêje: Hadê, dengekî Doyê bide min.

Jinik wekî leşkerê di bin fermanê de, gelekî cidî ber bi nava odeyê ve dimeşe. Dema dimeşe li derî, paşê li dîwarên sipî mêze dike. Paşê tê ber pencereya ku li hewşê mêze dike. Ronahiya payîzê. Pişta xwe dide pencereyê. Bi qasî gav û nîvek ji nivînê zilam dûr e. Bi ronahiya payîzê ku daye pişta xwe wekî peykerê jinekê xuya dibe. Bêtevger disekine. Çavên wê vedibin û tên girtin. Lêvên wê dilîzin. Demek dirêj derbas dibe. Mêşek bifire dê dengê baskên wê bêne bihîstin.

Zilamê extiyar li ser nivînan, hinekî xwe daye kêlekê, biriqîna çavên wî zêde bûye, li bendê ye, disekine. Jina extiyar êdî ne extiyar e, nefeseke kûr dikişîne. Dê dengê doyê bidê. Berê li ser sehneyê gelek caran çawa dabû, bi heman awayî. Çavên xwe digire. Niha li ser mêrgek kesk e. Li dû wê dibeze, wê… hezkiriyê wê yê yekemîn ku navê wî ji bîr kiriye. Di bin siya dara tûyan de digihîje wê, sing bi nefesgirtin û dayînê biling dibe û dadikeve, hezkiriyê wê, wê ber bi xwe ve dikişîne, wekî bixwaze ji dara tûyê hêzê bigire pişta xwe didê, lê ciwanê qeşeng bi hostatiyeke mezin zendên xwe li bedena wê dipêçe, nefesek kûr tê kişandin.

Çavên xwe vedike. Li hemberî wê ew zilamê extiyar. Li ber dayîna nefesa xwe ya dawî ye. Bi çavên xumam lê dinêre.

Sekinî, tûyê xwe daqurtand û dengê Doyê derxist, dirêj, dengekî dirêj ê Doyê; her ku dirêj bû li Wagner, Beethoven, li Mozart, Bizet her wiha li Goethe û Nietzche fikirî, ji ber vê yekê dengê Doyê hê zêdetir dirêj bû.

Ew, ê ku îblîs bi xwe bû, ew rêbir, çawa ku ji nişke ve ket odeyê, wekî şeytên bibîne ji nişke ve derî li dû xwe vekirî dihêle û direve. Dengê Doyê ku pêşî odeyê, dûre korîdorê dadigire, li dû îblîs digihîje hewşê, ji hewşê derdikeve kuçeyê, heta ku îblîs ji holê winda bibe dide dû. Zilamê extiyar di dema ku çavên xwe dide ser hev de, dibêje: Tu sax bî. Tu eynî wekî rojên berê yî. Dengê te qet neguheriye.

Bêdeng dibin.

Jinik hêdîka nêzîkî nivînê dibe. Dema lêvên wê li lêvên zilamê extiyar dikevin, zilamê extiyar ji nû ve çavên xwe vedike. Ji lêvên wî çend peyv, çend kîte dirijin. Lê jinik wekî ku wan nebihîze.

Zilamê extiyar niha bi destên xwe ji bo çûyînê îşaretî jinikê dike. Paşê, li ser lêvên zirav bişirîneke kujende, careke din çavên xwe digire.

Jinik, çawa hatibû, dîsa bi ser pêçiyên xwe vedigere, bêyî li dû xwe binêre ji odeyê derdikeve. Dibişire, dibêje va ye min mirin dît. Paşê bi dingekî bilind dike ku ew deng li korîdorê olan dide, dibêje: Çawa reviya ji dengê Doyê. Wê careke din serîkî jî li vê taxê nede.

Ji hewşê derbas dibe û derdikeve kuçeyê.

Li kuçeyê kes nîn e. Tenê keçikeke biçûk, di dest de qevdek gulebûkek, bi çavên kenîn, bi bezê nêzî wê dibe.



# BENDEWAR

Diya min, nexweş e, li nav nivînan, di guhê min de dinaliya: Ez çima namirim?

Ez jî ji bo wê aş bikim dibêjim: Dayê can, tuyê bimirî, hinekî sebir bike, tuyê bimirî.

Êvarekê, dema ez ji kar hatim got: Êdî sebra min nema, min bêriya bavê xwe kiriye, ez dixwazim herim cem bavê xwe.

Min bi mizurî got: Te bêriya bavê min kiriye?

Bi nalînî got: Na kurê min, ne bavê te, yê xwe.

Min got: Dayê can jixwe di nêzîk de tuyê bibînî.

Got: Kî dizane! Heta ez neçim wir ez çi bêjim jî derew e.



# KÎTEYA DAWÎ

*Ji bo bîranîna Can*

Berdestka nexweşan dema tepsî di dest de dikeve hundir, ew dibêje: Ez naxwazim. Ji yê li odeya din re bibe. Ewê li wir radizê nizane têrbûn çi ye.

Berî bimire her tiştê heyî, goşt, giya, çi dibe bila bibe dixwaze bixwe. Tu ji min re qetek nanê sorkirî û parçeyekî penîrê bêxwê bîne bes e.

Berdestka nexweşan got: Nanê sorkirî tune ye.

Yê nexweş got, "Bêje bila sor bikin."

Zêde dem derbas nebû, di nav taseke mezin de şorbeya tarhana anîn.

Nanê sorkirî, rûnê nivîşk ê bi îsota sor.

Dema kevçî girt destê xwe bişirî, di dilê xwe de got: Tiştê min xwest ne ev bû lê bila be, bavê min ji vêya pir hez dikir.

Pêşî şorbe bêhn kir.

Wekî ku bixwe, têr bû.

Kefçî danî, li ser nivînan xwe dirêj kir û çavên xwe girtin.

Dema çavên xwe vekirin li ber serê xwe hemşîreya rûken dît. Di destê wê de çarşefên sipîboz.

Got: Pêdivî bi guherîna çarşefan nîn e, ez bawerim berî bibe sibe ezê ji vê derê herim.

Hemşîre bişirî: Na, em nahêlin hûn herin cihekî.

Got: Hûn bernedin jî dê min bibin.

Dîsa çavên xwe girtin.

Li qeraxeke behrê bû. Devdelingên xwe qat kiribû, pêxwas li qeraxê dimeşiya. Binê piyên wî dişewitîn. Dest bi bazdanê kir. Paşê gihîşt behrê. Cemidîbûna avê ji bin lingên wî gihîşt heta hemû bedena wî.

Ricifî.

Dema ricifîn hê negihîştibû heta şatika wî ji dûr dengek hat:

Were viiiiir… Bavê te miiiir…

Got: Bavê min?

Paşê sê caran heman kîte bihîst: Bav-bav-bav.

Waye bavê wî li hemberî wî bû. Dest dirêjî wî dikir, digot: Bilezîne, em ji bo çûyîna dibistanê dereng dimînin.



# NAV

Di dawiyê de ez jî gihîştim temenê bavê xwe.

Niha wekî ez fêm dikim çima ew ji mirovan zêdetir bi çûkan re eleqedar dibû.

Lê yê min ne faqa min, ne muxurê min, ne qefesa min heye. Ne jî agahî, çavdêrî yan jî tecrubeyeke min a li ser çûkan heye.

Di van rojên biharê de, her serê sibê, dema roj hiltê, çûkek xwe li ser dara çamê ya li bexçeyê datîne û dixwîne. Lê ez nizanim ew îspînoz e, florya ye, îskete ye, zengilok e yan jî bilbil e.

Ji bavê min mîrate tenê nav mane ji min re. Ne bask, ne pirc, ne jî dengê çûkan.

Tuyê bibêjî mirov ger mirov be ev jî bes e.

Rast e. Lê ger derdê debarê tunebûya.



# HEWAR

Çi ecêb e, havîn hat û çû lê ez neketibûm behrê.

Wê jinika lawaz a ku ketibû bahrê û min ew xelas kiribû ev gotibû.

Min got: Siûda te hebû. Lê ger ez ne li vir bûma…

Got: Ji xwe ji ber ez soberî nizanim dê tiştek xweş ba. Lê ger lingê te neşemitiyana jixwe teyê ji bo xelaskirina min xwe neavêta behrê.

Min li der û dora xwe nêrî, ka kesek tê û diçe, kesek ku me bibîne heye yan na.

Kes tune bû.

Dema min pihînek li qûna wê da, min got: De hadê em te bibînin. Ka careke din biceribîne.



# BÊREHM

Min got: Te ew zarok carek din nedît ne?

Got: Na, min qet nedît.

Min got: Te ji bîr jî nekiriye ne, ma texmîna min şaş e?

Got: Tu mafdar î. Min qet ew ji bîr nekir.

Bi baweriya min mirovê herî dawî ku wî dîtibû jî tu bû.

Çavên wî li valahiyekê dinêrin, hema kêliyekê sekinî.

Got: Herhal wisa ye.

Baş e, ji wê rojê de, rûyê wî yê spîloçkî li pêşberî te, awirên şaşwazbûyî, lêvên diricifin û di destê te de jî demançeya ku bêhna barûdê jê tê, bi vî awayî tu çawa dijî?

Got: Tu çawa dikarî ew qas bêrehm bî?

Min got: Ev tola bîrê ye. Ma qet ji te re qal nekirine, te di pirtûkan de nexwendiye, ev tola bîrê ye.



# JI ARŞÎVÊ

Li gor belgeyeke ku min di arşîva malbatê de dît, kalê min di Şerê Mezin de şehîd ketiye.

Li gor belgeyeke din, ji ber ku ji şer reviyaye bi gulebaranê hatiye kuştin.

Belgeyeke sêyemîn jî heye ku ew jî dibêje, kalê min li ser nivînên xwe miriye.

Tiştê balkêş, di her sêyan de jî cih û dîroka mirina kalê min wekî hev in.



# WINDA

Min nedizanî ji kê bipirsim.

Ji ber vê yekê, min ji mirovê yekem ku li ser rê rastî min hat pirsî.

Wî jî nedizanî, ji min re got, ji dikandarê li qorziyê bipirse.

Min ji dikandar pirsî.

Wî jî nedizanî, got ji firincî bipirse.

Min ji firincî pirsî.

Wî jî nedizanî, got ji muxtêr bipirse.

Min ji muxtêr pirsî.

Wî jî nedizanî, got ji qereqolê bipirse.

Bê şik min bi nan û pîvazan aqilê xwe nexwaribû ku ez heta wir biçim û bipirsim.

Min demxeya "WINDA" li zerfê di destê xwe de da û qediya çû.



## XEWN

Sond xwariye ku dê min bikuje.

Min jî sond xwariye ku wî nekujim.

Divê çeka dueloyê ez hilbijêrim.

Ji ber ku çavên min baş nabînin min jî çûye demançe hilbijartiye. De îcar lê binêrin ku dîsa jî ew miriye.

Lê bi guleya kê? Vê yekê ne ez dizanim ne jî şahidên dueloyê.

Ez hişyar bûme…



# SOBERÎNERA DAWÎ

*Ji bo bîranîna Fureyya*

Tîrêjên pêşî yên rojê.

Jineke temenê wê nediyar, li serê wê kumê hesîl, di destê wê de sêlikek, li ser mayoyekî reş ku hinek tazîbûna wê dipêçe, li qeraxê hêdî hêdî ber bi behrê ve dimeşe. Dema gihîşt behrê, kumê xwe yê hesîl derdixe, datîne ser zembîlê, wekî filmekî ku hêdî biherike. Disekine, li behrê, li behrê wêdetir dinêre. Paşê bi gavên tirsonek ber bi behrê ve dimeşe. Dema digihîje behrê pêşî lingê xwe yê rastê dixe behrê. Çawa dixe, di cih de du gavan bi paş ve davêje.

Kêliyekê bêbiryar disekine. Paşê, bi biryar, ber bi avê dimeşe. Hildipeke. Dema av digihîje çong, bedena xwe wekî kulîlkeke ku avêtibin nav avê, xwe davêje. Qet xwe tev nade. Ajne nake. Milên wê li du aliyan vekirî, çav li asîmanan, xwe bera nav herikîna avê dide.

Dema zarok gihîşt qeraxê, jin êdî ji ber çavan winda dibû.

Zarokî her du destên xwe birin ber devê xwe û qîriya:

Fufu…Vegereee!
Lê deng negihîşt jinê.
Li ser pişte, di rû de rûkeniyek, dûr ket, dûr ket ji qeraxê.
Zarokî xwe bi xwe pirsî. Wisa ber bi ku ve diçe?.
Serê sibê.
Roj hiltê.
Her kes radize.
Kes tune bersivê bide.
Jixwe zarokî jî ji kesî tiştek nepirsî.



## PEYÎN

Mi va xo vîrra meke biewne saetê xo ra
Wexto ke nefesê xo yo peyîn dayne, va: ‘La çi faydê xo esto ke.’



# RAWESTGEH

Jinê got: Here. Ez êdî naxwazim te li vê derê bibînim. Bahola xwe bide hev û here.

Zilam bahola xwe dagirt. Du-sê kinc. Du-sê pirtûk. Du-sê plak...

Li hewşê xatir ji keça xwe xwest.

Zarok pirsî tu diçî ku derê.

Bavê wê got: Ber bi cihekî dûr ve.

Keçikê got: Min jî bi xwe re bibe.

Bavê wê got: Lê ez diçim cihekî dûr. Tu biçûk î, tuyê biwestî.

Keçikê got: Ez nawestim. Ez êdî mezin bûm. Ez qet nawestim.

Zilam hinekî sekinî, nesefek kûr kişand, got: Dê diya te xemgîn bibe.

Keçik wekî ku nebihîst tevgeriya.

Got: Deqekî bisekine, ez çenteyê xwe bigirim û bêm.

Di destê zilêm ê çepê yê bi nasir û xwêdandayî de destê biçûk, yê diheje û xwêdandayî yê keçikê. Di destê din de baholek. Di destê keçikê de hirçika wê ya biçûk ku bi guhê wê ve girtiye, dimeşin.

Keçik dibêje: Ji bo rawestgehê hê pir maye, wisa bi lez nemeşe. Tuyê zû bimirî.



# YÊ DIMEŞE

Tu wisa diçî ku derê?

Ez nizanim. Qey ez wekî ku diçim cihekî dixuyim?

Tu raste rast pêş de diçî. Wekî her gavî.

Ger ez neketama pêşiya te, te yê ez nedîtama.

Ma her kesê ku dimeşe diçe cihekî! Her kesê raste rast bi pêş de bimeşe li dîwarekî wekî te diqelibe?

Min tenê xwest ez halê te bipirsim.

Dema pihînek li paqê min da got: Va ye halê min dostê meraq-xur; tu bixwazî dikarî ji vê re bibêjî bîranîn jî.

Ez li dû wî qîriyam: Tu yê hesabê vê yekê bidî.

Bersiva ku min girt: Tîqetîqeke gelek dirêj bû ku olan bi kuçeyan xist.



## KETIN

Jinikê got: Dê bajar bikeve.

Mêrik got: Bajar li ber ketinê ye.

Jinek din got: Bajar dikeve.

Mêrekî din got: Xwedê neke.

Heman jinikê got: Xwedê kir jî.

Bajar ji zû de ye ket jî.

Heman mêrikî got: Tu ji ku dizanî, kezebreşê.

Jinikê got: Ji ber ku tu li vir î ez ji wê dizanim. Her wiha ji ber gumîna ku tê guhê min.



# GOR

Estoran ra hes kerdêne.

La heme emrê ê de tena yew astorê ê bî.

Wexto ke merd, ma nêzana ma do estorê ê sebikerî. Ma verada merge.

Estorê ê zî do nêzana sebikero.

Zaf derbas nêbi ke cehlmiya.

Ma hîrê dostê ê, bê ke yew bivîno, ma gorê ê kerd a û astorê ê zî tede nimit.



## BENÎADEM

Dema li nav daristanê tifinga xwe araste kir,

li pêşiya xwe ne sewalek, benîademiyek dît, şaş bû.

Dema tifinga xwe danî, pirsî: Tu ji ku derketî?

Benîademiyê birê wî ku nav deviyê derket, dema kêra xwe li dilê wî çikand got: Vaye ez ji vê derê derketim.



# MEHSÛM

Min got: Ger tu ji min bipirsî hemû mirov mehsûm in.

Dozger pirsî: Bi vegotineke eşkeretir, tu dixwazî bibêjî qet mirovekî sûcdar nîn e?

Min got: Na. Min tenê got mirov mehsûm in.

Dozger got: Tu jî, ez jî em mirov in-

Lê dîsa jî divê cudahiyek hebe. Li gor ku ez îdama te dixwazim…

Min ji dozgerê ku ji gotinên min tu tiştek fêm nekir re got: Ji bîr neke ku tenê qurbanî derewan nakin.



## BÊHEWAR

Bêhewar;
Ev navê lûtkeyeke çiyayekî bû;
Xwestibû bigihîje wir, ji wir li dinyayê mêze bike.

Ne çiyager bû.
Em nizanin gihîşt ser Girê Bêhewar yan na.
Ji ber ku piştî ket rê careke din kesî ew nedît.



# CEMIDÎN

Wî ez birim serdana gora ku dema bimiriya wê li wir “raza”.

Ji gorveder re got kalasên li ser gorê rake.

Min nêrî: çarkenarên gorê bi mermerê çêkiriye, binê wê jî axa bi nêm e.

Min jê pirsî ku çima binê gorê jî bi mermeran nepêçaye.

Got: Lê wê çaxê ezê pir bicemidim.

# II

# ÇÎROKÊN JIYANÊ

*"Jiyan, nexweşiyeke rih e"*
Novalis



# ZIMAN

Got: Yekem car ez ji bo we qal dikim ku ez yekî biyanî me û ez çîrokên xwe bi zimanekî biyanî dinivîsim.

Min got: Lê her kes hay ji vê heye. Zimanekî we yê nivîskî nîn bû. Lewma we nedikarî bi zimanê zikmakî binivîsin. Ji bo nivîsandinê divê we zimanek hilbijarta. Ev, zimanê yên ku hûn biçûk didîtin bû. We jî bi zimanê wan, çîrokên ku wan biçûk dixin nivîsandin. Zimanê *hevpar* herhal ev e. Her çiqas zimanekî hevpar nîn be jî.



# KURTE

Dostê min ê her demî wisa got, ez jiyana xwe dikarim bi van du hevokan bînim ziman:

Ez hatim xapandin û min xapandin.

Min got: Herhal dê berevajiyê vê jî rast be.

Got: Helbet. Lê divê tu vê ne ji min, ji wan bipirsî. Encax piştî ku tu li wan guhdarî bikî tu dikarî çîroka xwe binivîsî.

Min kesên ku bersiva pirsên der barê wî de bide nasnedikir. Dibe ku êdî wî bixwe jî nas nedikir. Ji bîr kiribû. Lewra êdî çîrokek ku ez binivîsim tune bû. Ji bo bi kurtahî meseleyê vebêjim min jê pirsî: Piştî ew qas demî tu çawa xwe dibihîzî?

Bi kurtahî; pê bawerî aniye û hatiye xapandin



# BI SIÛD

Apê min ê extiyar got: Koftehor, kî dizane heta êvarê tu li ku derê ewiqî.

Min got: Li goristanê.

Bi awayek gelek şaşbûyî got: Li goristanê? Baş e, te li goristanê çi dît?

Min got: Di vê rojeke biharê de mirov çi bibîne min ew dîtin.

Bûkzava, kuvarikên jehrî, mişkên nav zeviyan û helbet keçikên qereçî.

Apê min bêyî ku serê xwe ji ser pirtûkê rake got: Keçikên qereçî? Ka ji min re bibêje çawa dibe di vî temenî de, di rojeke biharê de tu diçî nav goristanê û rastî keçikên qereçî tê?

Min got: Ew her roj li wê derê ne. Labada, tolik, gezgezk, madimakê berhev dikin.

Serê xwe ji ser pirtûkê rakir, bi awayekî ecêbmayî got: Gezgezk, madimak? Keçikên qereçî ha! Ez hatim vî temenî min ew nedîtine, nexwarine. Keçikên qereçî ha, wisa? Hey tu koftehorê bi siûd. Ger tu ji bîr nekî, sibê min jî bibe goristanê.



# SIRGÛNIYEKE ECÊB

*Ji bo Demîr*

Min berê qet biyaniyek nas nekiribû.

Di zarokatiya min de ji min re gotibûn ji wan dûr bisekine; ez jî dûr sekinîbûm.

Lê piştî ew qas tiştên ez jiyam, ez bi dilekî rehet dikarim bibêjim ku piştî ez hînê zimanê wan bûm, min pirtûkên wan xwendin, her wiha ji wan bi çendinan re min hevaltî kir jiyana min guherî.

Ji nişke ve sekinî û paşê ev gotin lê zêde kir: Tu dizanî tu hesabê min ku ez bidim kesî tune ye.



# DIJRABER

Tevî zarokan me dilîst.

Ji nav wan yekî got: Ez diçim.

Min got: Bi ku da? Hê me nû dest bi lîstikê kir.

Weledî got: Dema min ku lîstikê bilîzim nîn e. Tenê ji bo ez bibînim hûn kesên çawa ne ez hatim nava we.

Min got: Hatiye binêre! Kê axaftineke wisa hînî te kir? Hadê pitikê diya xwe, bi devê xwe yê hê bêhna şîr jê tê careke din neyê nava me.

Bi vî awayî diya te jî ji bo li te bigere dê nîvê şevê neyê van deran, tevî birê min di wê tarîtiyê de winda nebe, bavê te yê sermest jî wê neyê ber deriyê me, bavê min jî dê wî şil neke.



# KÛÇIK

Tê bîra te dema cara pêşî me ew dîtibû, çiqas dilê me pê şewitî bû.

Ne mimkûn bû dilê me pê neşewite.

Me dayax nekir, me ew anî mala xwe.

Ma, me wekî din dikarî çi bikira?

Ez nizanim. Dibe ku ji ser pirê re me ew biavêta nav çem.

Ma wê çi biguheriya? Kûçik soberiyê dizanin.

Wê çaxê dê bi dû me neketa, ji deriyê me neketa hundir û di hefteya em hatine de bêyî tiştek biqewime dê pehniya te gez nekira. Lê niha, ji bo te derew derxe, hatiye ber çokên te veniştiye, destên min dialêse.

Min got: Hûn nabin zilam. Eynî wekî hemû kûçikan.



# JIXWEBER

Cihê her geriyam û dîsa lê vegeriyam ev der e. Ji xweber.

Ev cîhê reş. Ev cihê ku ez lê nan û zeytûnan dixwim û dikevim nav ramanan.

Ev cihê ku ez lê dibêjim, Ax! Xwezî pîvazeke min jî hebûya. Jixweber.

Ev cihê ku min lê Kant û Spinoza nas kir. Bimirinî. Jixweber.

Ji ez diricifim. Fikreke ku min germ bike jî nîn e.

Ew jî nîn e.

Dengek Doyê jî nîn e.

Bila kambax bibe ev cîhê reş.

Dema min wisa digot ji nişke ve derî lêda. Jixweber.

Paşê pencereyan. Jixweber.

Paşê birûsk li çinara li hewşê ket. Jixweber.

Min fêm kiribû. Dixwest ez ji vê derê herim.

Jixweber.

Lê ezê neçûma. Ji ber xwe.

Divê bihatana ez ji vê derê biqewirandama.

Ev jî çêbû, hatin min ji vir qewirandin.

Ji ber ku zêde tiştên min tunebûn, zêde ne zehmet bû.

Min got: Wisa hatibe nivîsîn dê wisa be. Min çenteyekî biçûk ku ji bavê min mabû; têde neynikek, sabûneke traşê, firçeyê traşê, mecûnek diranan, firçeyeke diranan, şehek, cotek gore, fanîlayek, derpêyek, du pirtûkên pîroz têde û ez ketim rê. Jixweber.



# KÊM ZÊDE

Ji min re bigota, ez li bextewariyê digerim, li dû bextewariyê me, ji bilî bextewariyê li tiştekî din nagerim, minê jî derew nekira û hêvî nedayê.

Bi vî awayî, dê xeyalên wê neşikiyana; minê jî, piştî salan, her çiqas ez zêde poşman nebim jî, minê ev rêzik nenivîsandana.



# RÊ

A rast ez ji çûkên ku di şevreşê de difirin hez dikim. Bi taybetî li qeraxa golê. Ew, ji kengê de ye tune ye. Çivîk jî nîn in. Jixwe ez jî ne li qeraxeke golê me, ne li kêleka hewzê.

Ez li nav daristanekê bi pêş ve dimeşim, dikim rêya xwe bibînim.

Kî dizane, dibe ku ez aciz dibim.

A rast, bi vî awayî, yan wî awayî, tiştên ku min şaş dihêle, yan jî ditirsîne li ser rûyê erdê nîn e. Loma, tu wateya dîtina rê, yan nedîtina rê tuneye.



# BES

Wa şorbayeka germinê mi bibo, û yew zî doşeko ke simerin.

Wa veng çinêbo, teqûreq çinêbo, kesek nêdo beyray min ro, yanzî kesek o ke mi emrê xo de nêvînawo û ez pawê ê nêbîya wa bido pero.

Wa kûpê mi de awe, yanzî wa deneyê mi de şerab bibo.

Tay zî ardê mi. Tay zî sole. Çend cema zî kolî mi.

Çekuye çinêbî zî beno.

Ez bi heceyan nûsena.

Heceyî çinêbî zî beno.

Vengdayişê dîkî. Zirayişê herî. Lawitişê kutikî. Hîşayişê bergîrî. Xûşayişê awe.

Şil- şil- şilîya varanî.

Nê heme bes ê.

Bi rastî?

Ê, ê. Bes ê û zaf ê zî.



## MALBATEKE ECÊB

Ez nizanim ez ji ku derê hatim vir.

Ew jî nizanin.

Ne ku ez ji ku derê hatime, nizanin ew ji ku derê hatine.

Her wiha ez bi heman zimanî jî bi wan re xeber nadim.

Her wiha ew jî, di navbera xwe de bi heman zimanî xeber nadin.

Bi vî awayî, (malbateke ecêb!) hema wisa em bi hev re roja xwe derbas dikin û dijîn.



# BEZÎNER

Min got: Tu her dibezî, her dibezî, tuyê qet ranewestî?

Got: Ez nizanim rawestim. Tenê hûn ji ber rêya min xwe bidin alî û wisa pirsên bêwate ji min nekin bes e.

Min got: Tu wisa dibezî, herhal cihekî ku tu xwe bigihînî heye. Ma hînî te nekirine ku dinya gilover e, tu çiqas bibezî bibeze, cihê ku tu xwe bigihînî dîsa ev der e.

Bi nalînî got: Ji min re rê vekin, rê vekin. Ez carekê rawestim ez dê careke din nikaribim bibezim, ma hûn vê yekê fêm nakin?



# BELKÎ

Belkî axiviye. Qet diyar nabe.

Belkî xwe li keriyê daniye. Qet diyar nabe.

Belkî mijar ne ew be.

Di vî warî de tiştek nikare bê gotin.

Belkî wê demê ew li cihekî din bû.

Ev jî mimkûn e.

Belkî dema min dest bi nivîsîna van rêzikan kir her tişt eşkere bûbe.

Belkî van kêliyan, ji kesekî xwedê belayê bidê re dibêje ez ji te hez dikim.

Qet diyar nabe.

Diyar nebûn jî, ger hûn rastiyê bipirsin, (qet nebe ji bo min) pir, pir baştir e.



# BÊDENGÎ

Jinê got: Tu çiqas bêdeng î. Sê roj in em bi hev re ne. Sê hevok ji devê te derneketin.

Zilam, çav li çavên jinê, bersiv neda.

Jinê got: Lê wisa bidome ez nikarim bi te re bijîm.

Çavê rastê yê zilam kirpiya, lêvê wî yê jorîn lerizî.

Jinê got: Nizanim, dibe ku ev inyadek be. Tu min diceribînî.

Zilam bêyî ku çavên xwe ji çavên jinê avarê bike got: Cakêtê min li ku ye?

Jinê got: Ecêb e, hevoka çaremîn: Cakêt. Li jor e, li odeya razanê. Tuyê cakêt çi bikî?

Zilam dema ber bi derenceyê ve diçû got: Dirêj neke. Cakêtê min bide. Dema çûyînê hat.



# ÎTÎRAF

Zemanekê Afrîka de mendbî.

Vatêne ke; Mi miyanê înan de xo qet xerîb nêdî. La zey yamyamêk? Erê!



# AXAFTIN

Jiyan sar bû.

Te got hewa sar bû?

Na, jiyan sar bû.

Birînên te jan didin?

Birînên min, belê.

Mirov nikare dayax bike ne?

Belê, eynî wiha.

Însanê reben.

Çi eleqeya vê bi însanetiyê re heye?

Baş e, lê eleqeya wê bi çi heye?

Bi birînên min ve. Tenê bi birînên min ve ku nakewin, bedenê min dikojin.



# ÇÎROKEK

Min ji wê re got: Ez bi çîroka te dizanim.

Got: Tu cudahiya ji yên din nîn e, helbet tuyê bizanibî.

Min got: Yên din kî ne, ez nizanim. Lê ez ya te baş dizanim.

Got: A rast çîrokek min a şexsî tune ye. Ez sih salî me. Diya pênc zarokan im. A rast ez diya wan bûm. Niha du zarokên min hene. Mêrekî min hebû. Du jinên din ên wî hebûn. Heft zarokên mêrê min ji jinên din hebûn, sê kur, çar keç. Wan par ew kuşt. Em jî, sê jin, şeş zarok wisa li holê man. Paşê, şevekê ew hatin gundê me şewitandin. Em jî zar û zêç ketin rê. Niha em li vir in. Vaye çîroka min. Ev der ku der e, tu kî yî ku fotografên me dikişînî pêşî bersiva van bide, paşê ez ji te re qala dawiya çîroka xwe ya rastîn bikim. Yan nekim.

# III

# ÇÎROKÊN ELETEWŞ



# ŞOP

Wan rojan ez her dihatim şopandin.
Ez  aciz bûm.
Min jî dest bi şopandina yên ku min dişopînin kir.
Bi vî awayî di navbera me de wekheviyek çêbû:
Ew jî, ez jî, em hem bûn yê dişopînin, hem yên têne şopandin.



# SIÛD

Min ji wî re got: Tu demê çekek min çênebû.

Pirsî: Baş e, wê çaxê heta niha te bi çi şer kir?

Paşê got: Ez lava dikim, ji min re nebêje min bi peyvan şer kir.

Min got: Na. Min peyv wekî çek bikar neanîn. Lê razeke wan a çawa heye ez nizanim. Wan ez ji hemû çekan parastim.

Got: Tiştê ez dizanim berevajî vê dibe. Kesên baş bizanibe peyvan bikar bîne, wekî miqnetîzekê belayê ber bi xwe ve dikişîne.

Min got: Herhal yê min siûd e.

Siûd? Li hemberî çekan, yan li hemberî peyvan?



# ÇOL

Mi zaf cayî vînay. Koy, deştî, zozanî, behrî, bajarî û paytextî…

La heta eyro mi qet çol nêvîna.

Mi çol nêvîna, la ez zana ke, ê ke çol nêvîno, nêhesîbîyeno ke qet çî vînawo.



## KILÎD

Kilîd li ku ne?
Ez nizanim.
Tuyê ji ku bizanî ezê kîjan derî vekim
Kilîdên ku tu nizanî li ku derê ne



# REMAYIŞ

Na rêwîtîte zaf derge bî.
Heme rey de ma tenî zinarê pîlî û derey vînay.
Ma merdimî nêvînay.
Qet darî nêvînay.
Tenî kutikî bîbî.
Bi şewan zî tenî çeqelî bîbî.
Wexto ke bî serê sibay mi persa: Merdimê tîyay ça de yê?
Înan va: Ma nêzanê.
Ez vana qey wexto ke pê hesiyay ke ma do bêrê, ê şîyê.



## TEYŞANÎ

Serê hênîyek de virderto,
Qîrayne û vatêne: Nê cayan de çîkey şimitişî çînî yo?
Mi hênî mojna ci.
Va:  No nêşkeno teyşanîyey mi bişikno.



# VEQETÎN

Zilam got: Tu qet min nefikire.
Çawa be, ezê ji xwe re rêyekê bibînim.

Zarok bang kir: Bavo!
Ez çawa li te nefikirim.
Ez bimirim jî ez te ji bîr nakim.
Zilam got: Gotinên wisa nebêje û min neêşîne.
Hem, jixwe dora mirinê ne ya te ye, ya min e.
Zarok got: Bila be, dîsa jî ez ji bîr nakim. Ma tu ne bavê min î?
Zilam got: Negrî. Ne hêja ye.



## RASTLÊHATIN

Zilam got: Çavên min nabînin.

Min got: Guhên te dibihîzin?

Ew naliya: Çavên min nabînin.

Min got: Xwezî çavên te bidîta û guhên te nebihîstana.

Nalîna xwe dom kir: Çavên min nabînin.

Min got: Li min binêr dostê min, tu du caran bi siûd î.

A rast sê caran: Hem çavên te nabînin, hem guhên te nabihîzin, hem jî te kesek ku pêre biaxivî ji xwe re dît. Bi ser de jî, ew xwedî şarezayiyeke ku dikare van bibîne, bibihîze û li ser kaxiz rêz bike.



## DESTPÊK

Şahiyê wê demê dest pê kir.
Tam wê dema ku kesek ji nav me (kî bû?) rabû,
pirsî: Em bi ku de diçin?
Ji me yekî nedizanî em bi ku de diçin.

Wê demê, wekî ku em diçin cihekî, tevî wê muzîka ecêb ku nediyar bû ji ku tê, me hewl da xwe, me lîst, me govend gerand, stran got.
Va ye çîroka windakirina me ya rê, ku biqasî bikêf e ewqas jî bi êş.



## SOHBET

Pirsa, di nav jiyanê de tiştê herî girîng çi ye? kir û qurtek ji eraqa xwe vexwar.

Min got ez nizanim û min jî eraqa xwe daqurtand.

Got: Tu rastiyê bipirsî ez jî nizanim.

Pêşî qurtek ji eraqê xwe, dûre ji ava xwe vexwar.

Min got: Tu mafdar î.

Min jî ji eraqa xwe, paşê ji ava xwe qurtek vexwar. Û min bi ser de kir: Hem jî tu pir mafdar î.



## BI TAYBETÎ

Ma ne hewce ye divê mirov bawerî bide?
Di dema nivîsînê de?
Belê. Bi taybetî di dema nivîsînê de.
Di dema nivîsînê de bi taybetî tu tiştekî ne lazim e.
Bawerîdayîn ji xwe qet ne lazim e.
Baş e lê çi lazim e?
Guhdariya li dengê peyvan. Guhdariya li dengê pênûsê.
Û (helbet) guhdariya li dengên xwe yê hundirîn.
Hemû ew qas?
Na. Lê ew qas jî bes e.



## LI DÛ

Min tu tiştek negot.

Wî jî, ji xwe guh neda te.

Lê wî, zilamekî din kuşt.

Xem nexwe. Tu kesek neaxive. Lê dîsa jî her roj bi dehan mirî hene. Dema ku yê tetikê dikişîne û yê nîşan dide ne heman kes be pirsgirêk nîn e. Bi taybetî ger yê dimire kesekî din be.



## TALOQKERDIŞ

Ez vejîyaya serê şaneşîne.
Mij.
Ez nêvînena, la vînena.
Behr çende metrey wetê mi de dest pêkeno.
Dima weverê behrî.
Zingilêka mijî.
Yewna zingilêka mijî.
Ez nêvînena, la eşnawêna.
Behr zaf serdin o.
Ez vana qey ez eşkena nê karî taloq bikerî.
Qet nêbo çende rojê bînî zî.



## QET

Me çi digot?
Qet.
Ha! Wê çaxê em vegeriyan cihê me jê dest pê kir.
Me ji qetê dest pê kiribû?
Belê, ez bawerim wisa bû.
Wê çaxê em dîsa dikarin dest pê bikin.
Çima nebe? Pêşî tu dest pê bike.
Me çi digot?
Qet.



# ÇILE

Tu, ji min dûr, li wan dûrahiyan,
Bêyî min, bêyî ez li cem te bim,
Bêyî dengê te bibihîzim,
Bêyî dengê xwe bigihînim te,
Ez fikirîm ku te gelek êş kişandiye.
Ya rast, ez nikarim bibêjim min êş kişandiye.
Lê ez gelek cemidîm.
Çileyê zivistanê.
Ne komir hebû, ne êzing. Ne jî tezek.



## NIFIR

*Bila çavên felekê kor bin*

Te berê ev biwêj bihîstibû?

Belê.

Tê çi wateyê?

Vê ji min nepirse. Ev daxwazeke ecêb e.

Ger çavên felekê kor bibin, em feqîrên xwedê ku pênûs di dest de ne, emê çi bikin, çi binivîsin?



## RONAHÎ

Tu ronahiya li dawiya korîdorê dibînî?
Helbet dibînim.
Wê çaxê tu çima nanivîsî?



## ROJ

Ox! Çi rojêko weş.
Vinde, verê ke roj nêşîyero awan
çîko nayîn mevaje.



## COT

Ger wê kêlîkê min têtik nekişanda---
Ez dizanim, niha ezê ne li jiyanê bûma.
Ez jî.



## KAF*

Rojekê, wexto ez kuçeyanê Berlînî de geyrayne,
Mi Kafka dî.
Ey zî ti vînay?
Erê.
Va çi?
Persêke veredayî persa: Ti jî şinê ewca?
Min vat: Erê.
Ê va çi?
A çaxî ma têdir nêşkenê bikoy rey.

* Notê açernayoxî: Niştoxî "Kaf" qeybî koy Qafî şoxilnawo.



# BÊFÊDE

(Not: ji Edgü pirsine, navê çîrokê ji Az'ê min kir Bêfêde)

Çavdêriyên min vê ji min re dibêjin:

Rûnê li cihê xwe, dengê xwe neke. Dernekeve bexçe jî, bila dengê te nebihîzin.

Ev tê çi wateyê?

Her tişt. Hemû rêyên ku heta îro tu ketî ser, jê gerînekek çêbû.

Te kir nekir tu nikarîbû ji nav vê gerînekê derkevî.

Gerînekek? Niha te ev ji ku derxist?

Ji pirtûkên ku te xwendin. Ji nivîsên ku te nivîsîn.

Lê tiştek ku tu pê nizanî heye, çar kenarên jiyanê nîn in, bi hezaran aliyên wî yên ku pê nayên zanîn hene. Bêyî ku tu vê bizanibî, tu çi bixwînî, çi binivîsî jî bêfêde ye.



## WÊREK

Kî te diparêze?

Kes naparêze.

Wisa be, tu li ser bêrê rûniştî bi ku de diçî? (NOT: Vê hevokê ji Edgü bipirse, KÜREK…)

Naçim tu derê.

Pûsûlaya te, nexşerêya te tune ye?

Tu tiştekî min nîn e.

Baş e, canparêzê te?

Ez soberiyê dizanim.

Ma kesî ji te re negot ku di vê ava herikbar de, soberînerên herî baş jî nikarin xwe bigihînin qeraxê?

Gotin, lê dîsa jî ezê biceribînim.

Ev çi dînîtiyeke mezin e!

Dibe. Lê ez heta vê derê her bi ceribandinê hatim.



# BÊÇARE

Di dawiyê de kûçikek ji xwe re kir ewlad.

# IV

# HATIN Û ÇÛYÎN



# HATIN Û ÇÛYÎN

*(Parîs/Café Select/ Bihara 1960'an)*

Adamov dikeve hundir. Di lingên wî yên tazî de qabqabik. Devlingên pantolan qat kiriye, zendê qutik qat kiriye, li ser lêvên wê *Boyard* pêçayî ye. Bi çavên tirsanok pêşî li aliyê rastê, paşê li çepê dinêre. Kesekî nas nîn e. Ber bi barê ve dimeşe. Qurtek li bîraya xwe dide. Li kêleka min Guner, bi aliyê wî de dinêre û wekî dengê mirîşkan dibêje: "Ping-pong-ping-pong-ping-pong".

César dikeve hundir.

Gabrialle di cih de ber bi wî diçe. Ji lêvên wî de maçî dike.

Paşê vedigere.

Dema vedigere cem maseyê dibêje: Ji Cesar re bibêje bila haya wî ji qûna wî hebe"

"Zûde hay jê heye jî. Hem ne tenê, qûn."

Hakki Anli dikeve hundir. Bi pozê xwe yê biçûçik, di dev de qelûn, bi çeneya wî ve rîyek wekî yê bizinan.

Dipirse, “Lo, zarokno hûn çawanin?” Bêyî ku li benda bersivê bimîne (jixwe kesê ku bersivê bide jî nîn e) wisa dipirse: “Zarokno, kî dizane, wisa peynîrê xweş li ku derê tê firotin?”

Guner dibêje: “Li cem Rusê li Rue Vavinê.”

Pirsa “Zeytûnên baş jî hene?” dike.

Ez dibêjim: “Pastirmaya wî jî heye.”

Hakki: Binêr ev baş bû.” Paşê disekine û dibêje: “Ecêb e, li cem rusek pastirma, ecêb e…”

Bi bejna xwe ya bilind Mubîn dikeve hundir.

Dibêje: “Heyran, ev çi serma ye” û paşê bi gotina “Monsieur Raymond” gazî garson dike. Û bêyî hê garson were dibêje: “Ji min re *Carlsberg*ek.”

Mubîn dema bîraya Danîmarka vedixwe pirsa “Zarokno ji welat çi agahî hene?” dike.

Ji nav me yek dibersivîne: “Masî derketiye ser darê.”

Hakki dibêje: Ger wisa be ez serîkî li rûs bidim.”

Dema Hakki lê dide, Guneş dikeve hundir.

Dibêje: “ dilê min, tu hê li vir î?”

Ez dibêjim: “Wekî tu dibînî.”

Dibêje: “Lê wisa nabe ku” û didomîne: “Te ev der ji xwe re kiriye navendek. Ka wê navenda me tuneba.”

Ez dibêjim: “Ev der wekî navend nayê hesibandin.”

“Lê ger mirov ji bîst û çar saetan diwanzdeh saetên xwe li cihekî derbas bike ew der navenda wî kesî ye.”

Ez dipirsim: “Kî vêya dibêje?”

Dibêje: “Ez dibêjim.”

Ez ji Guneşê re dibêjim rûne.

Dibêje: “Ez ditirsim. Ez ditirsim ku ez carekê rûnim ezê jî êdî ranebim. Hadê em herin cihekî û vexwin.”

Ez dibêjim: “Hinekî bisekine.”

Dibêje: “Sekinîn. Ma wekî din em çi dikin? Ka min bizanibûya em li benda çi disekinin. Tu dizanî em li benda çi ne?

Senac dikeve hundir. Li cem hevalekî wî heye. Di dest de pirtûkek ku nû derketiye dixwîne.

Dibêje: “Di nav rojên pêşiyên me yekê de em hev bibînin.”

Ez dibêjim: “Tiştek vexwe.”

Çavê wî li Guneşê ketiye, dibêje: “Gere ez herim.”

Demîrê ku heta wê demê bêdeng sekiniye dipirse: “Ev nivîskarekî ye?”

“Helbestvanekî ye.”

Dibêje: “Diyar e, çav berda Guneşê.”

Guner dibêje: “Tu zilamên wisa ji ku dibînî!”

Ez dibêjim: “Ez wan nabînim, ew tên min dibînin.”

Guneş dibêje: “Li min binêre, ez rûnim ezê ranebim, haydê.”

Ji dûr ve Selîm dixuye. Bisqilêta wî pêre. Bi gîdonê wê girtiye. Bi hev re bi pêş de diçin. Bisqilêta xwe datîne cem çinara li ser peyarêkê. Me dibîne û tê cem me.

Bi dengê xwe yê nizm: “Merheba zarokno, îro çi rojeke xweş e wisa.”

Ji garsonê ku nêzî maseyê dibe *cafe creme* dixwaze.

Ez ji Selîm dipirsim: “Xebat çawa diçe?”

Dibêje: “Gavek ber bi pêş, du gav ber bi paş ve.” Di rûyê wî de bişirînek.

Ez dibêjim: “Wisa be baş diçe. Dibe ku berevajî ba jî.”

Dibêje: “Na, çênabe. Ez winda bikim ezê çi bikim? Îro roja min a bi siûd e. Min deh fotograf kişandin. Min nanê xwe derxist.”

Ez bi şaşwazî dinêrim, ew dibêje *“Monsieur Raymond un rouge”* û ji xwe re şerabekê dixwaze. Berî ku şerab bê Îhsan dikeve hundir.

Ji Adnan dipirse: “Kekê Adnan, mîdye çawa ne?”

Adnan dibêje: “Min hê xelas nekiriye, pir zehmet e.”

Ez dibêjim: “Tu jî portreyê çêbike. Resmên taziyên xweşik çêbike.”

Adnan dibêje: “Model li ku ye?” Cidî ye, lê zêde dike: “Hem mîdye cuda, portre cuda ye. Tazî jî tam cuda ye.”

Ez radibim, dibêjim: “Bi xatirê we zarokno.”

Demir dipirse. “Tu bi ku de diçî?”

Ez dibêjim: “Ez nizanim.” Ez li Guneşa ku heta wê demê li ser piyan bêdeng sekiniye dinêrim.

Guneş dibêje: “Em herin dilê min. Êdî bes e, em herin.”

Adnan dibêje: “Wisa be ez jî werim.”

Adnan, Guneş û ez, em derdikevin.

***Berêvarkî.***

Tanpinar tê. Pardesûyê cûnik ê gabardî ji xwe dike û rûdinê.

Dibêje: “Ez exlamûrekê vexwim. Ez cemidîm.”

Wê kêliyê Gabriella tê û ji lêvên wî maçî dike. Û çawa hat bi vî awayî bi gavên bezê derdikeve.

Tanpinar dipirse: “Ev kî ye?”

Ez dibêjim: “Bakîreyeke Montparnasse ye.”

Dibêje: “Çû ku, gazî bike. Ji bîr neke ku li vê derê bakîrekî Stenbolê heye.”

Giacometti dixuye. Ji derî li hundir mêze dike, lêdide diçe.

Goldmann tê.

Bi bedena xwe ya qirase û Mobyletteya xwe. Mobyletteya xwe li ber darê datîne û dikeve hundir. Di dema ku bîraya xwe vedixwe de rojnameya xwe ya ku kiribû heşt qat û kiribû bêrîka xwe derdixe, dest bi xwendinê dike.

Huseyîn dibêje: “Tu vî qelewî dibînî? Lîstikvanekî bilardoyê yê baş e. Gelek caran tê qehwexaneyê li Rue du Depart. Carekê jî bi min re lîst.”

Min got: “Tu dizanî kî ye?”

Dibêje: “Na. Kî ye?”

Ez dibêjim: “Hema yek jê.” Paşê ez bi ser Tanpinar de vedigerim dibêjim: “Mamosteyê min ê zanîngehê ye.”

Tanpinar dibêje: “Na lo!”

***Êvar.***

Atîllayê biçûk dikeve hundir.

Dibêje: “Çi diqewime lo? Li holê hes û hewar nîn e. Nexwe em dimirin?”

Kuzgun tê.

Dibêje: “Ji min re *‘rhum’ek*, divê ez vegeriyam jiyanê.”

Sam Francis, Mobylette xwe datîne ber çinara ku gavek berê Selim fuluspîtîna xwe danî wir. Dema di ber maseya me re derbas dibe dipirse: “Mubîn nehat?”. Bêyî ku li benda bersivê bisekine dikene û derbasî barê dibe.

Ez dibêjim: “Waye Foujîtayê japon ê extiyar ku ji derî dikeve hundir. Leonardo Foujita.”

Kuzgun dibêje: “Ew delala pêre kî ye?”

Ez dibêjim: “Ew Împaratorîçeya Japon e.”

Yuksel dikeve hundir.

Dema dipirse: “Hûn bi çi dikenin?”, bi dengekî bilind ku ev li Gargantua tê, dikene. Dibêje: “Ecêb e. Hemû mezinên tirk li vir in. Hupkirinek heye? Kah-kah-kah.”

Tanpinar dibêje: “Zarokno hûn ecêb in. Tiştekî xweş e ku mirov bi we re be. Lê wê rojê ez li nava we bûma ezê dîn bibûma. Welhasil, ezê dîsa bêm. Ger we Selim dît, jê re bibêjin bila li min bigere.”

Dr.Fahri tê.

Dibêje: “Heyran li vî welatî çiqas nexweş hene.”

Ez dibêjim: “Tu dixwazî bibêjî yên bi qansêrê ketine.”

Dibêje: "Belê, helbet."

Ez dibêjim: Li vê derê her tişt pir e. Yên qansêrbûyî, yên alkolîk, wênesaz, nivîskar, qehpik, pirtûkfiroş, nêro, nêremok, bavadem, dayik Havva, yên bibext yên bêbext…"

Kedros dema di ber maseyê re derbas dibe silavê dide û bi bişirîn dipirsin: "*Jeune Turc (Nota wergêr: Jon Tirk)* dîsa plana lidarxistina derbeyê çêdikin?"

Berî bikaribin bersivê Kedros bidin, bi bejna xwe ya kurt, destên xwe yên xurt û riyê xwe yê gur peykersaz Haber dixuye.

Wekî her gav ez bi tirkî jê re dibêjim, "Çawa diçe?"

Ew jî wekî her gavê bi gotina "*C'est dur,c'est dur*" bersiva min dide.

Kedros, Haber û ez, em dikenin.

Dr. Fahri, Haber nîşan dide û dibêje: "Derdekî vî zilamî heye."

Ez dibêjim: "Ma derdê kê tune ye!"

Dibêje: "Yê wî ne wekî derdê min û te ye. Jê re bibêje, rojekê bila were nexweşxaneyê cem min."

Haber dipirse: "Ev hevalê te yê diaxive çi karî dike?"

Ez dibêjim: "Qanserolog e:"

***Rojeke din.***

Ez dikevim hundir. Maseya min vala ye. Ez li cem rûdinim. *Le Mond*eya xwe vedikim. Ji Monsieur Paul meya xwe (*une fine â l'eau)* ya her gavî dixwazim.

Îzak tê. Bêyî barandankê xwe yê donîn derxe rûdine.

Dibêje: "We nûçe xwendin?"

Ez dibêjim: "Belê."

Dibêje: "Ev der welatekî ecêb e. Mirovan dikujin. Çend nivîskar dengê xwe bilind dikin, dibêjin qey demokrasî ev e. Ev der welatekî tirsnak e."

Ez dibêjim: "Ger tu bixwazî em vegerin welatê xwe yê hêja."

Dibêje: “Min nexwest wisa bibêjim.”

Di dema ku ez qurta dawî ya *Fine â l'eau*ya xwe vedixwim Beckett dixuye. 2CV'ya xwe hinek li wî alî hiştiye. Li ser milên wî *tweed* cakêtekî gewr. Di dest de *Le Monde*.

Bêyî bi çavên xwe yên miyop li dora xwe binêre diçe li cem maseyeke vala rûdine. Piştî kêliyekê ez dibînim Monsieur Paul bîraya wî dibe didê.

Îzakê ku bi awayê veşarî hem li min, hem li wî dinêre, dipirse: “Te pirtûka wî ya dawî xwend?”

Ez napirsim pirtûka kî ya dawî.

Ez dibêjim: “Na.”

Dibêje: “Divê tu bixwînî.”

Ez dibêjim: “Van deman ez *Golem*a ku te dabû min dixwînim.”

Dibêje: “Te çawa dît?”

Ez dibêjim: “Ecêb e”

Dibêje: “Rast e. Tu mafdar î, ecêb e. Lê (Li Beckett dinêre û axaftina xwe didomîne) yên wî jî ecêb in. Hevok xilas bûn, bi peyvan re di xirecirê de ye.”

Ez dibêjim: “Paşê jî dê bi kîteyan re bikeve nav xirecirê. Helbet ger temenê wî têrê bike.”

Dema ku Îzak şîrê xwe vedixwe, Monsieur Levy dikeve hundir. Pêşî li aliyê rastê dinêre. Her hal Beckett dît. Piştî kêliyeke sekanê min ev fêm kir. Paşê, li aliyê çepê, li aliyê me dinêre. Wî, em dîtin. Nêzikî me dibe û bi dengekî nizm silavê dide. Ez radibim alî wî dikim ku li ser kursiya di navbera min û Îzak de rûne. Piştî çend nefesên kûr kişand, dipirse: “Mîrze wêjevan çawa ye?”

Ez dibêjim mîrze wêjevan baş e.

Bi ser Îzak de vedigere, vê carê, “Mîrze matematîkvan çawa ye?”. Îzak jî dibêje ku ew baştir e. Em her du (Îzak û ez) dibêjin: “Leopold Levy çawa ye?”

Dibêje: “Dimeşe. Jiyan pir zehmet e. Temenek dirêj. Bi tena serê xwe jiyîn zehmet, gelek zehmet e.”

Ji Paulê ling li erd re dikişîne û tê, çay dixwaze. Paşê wekî binale dibêje: "Xebitîn, xebitîn, xebitîn… çareyeke din nîn e. Lê di dest de tiştek jî nîn e. Jiyan wisa ye." Wekî ku bikene.

Fikret Mualla bi kulekî dikeve hundir. Li ser milên wî *tweed* cakêtekî kevinbûyî. Di bêrîka cakêtê de şûşeya konyak yan jî vîskiyê. Di devê wî de cixare. Bi zorê li ser piyan disekine. Ji bo ez nîşan bidim ku em li wir in ez dest lê ba dikim. Vadigere bi çavên pirsiyar li me dinêre. Wî, ne Fikret Mualla ye.

Remzi dibêje: "Ew kî bû te jê re dest hil kir?"

"Rihek bû. Hat û çû."

Demir dikeve hundir. Li cem keçikek xweşik ya birûreş, çavreş, laşsipî heye.

Dibêje: "Heyran, binêre min ev li erdê dît."

Abîdîn dixuye. Li ser milên wî muşembayeke sipî.

Li ser rûyê wî bişirîneke henekî.

Dibêje: "Zarokno, hûn çi rûniştine wisa? We nebihîst, şoreş çêbûye."

# NAV

*(Li gor rêza di nav nivîsê de)*

Adamov (Arthur) – Nivîskarê Şanoyê
Güner (Sümer) – Nivîskar, şanoparêz
César – Traşker (Yontucu)
Hakkı Anlı – Wênesaz
Mübin (Orhon) – Wênesaz
Güneş (Eskin) – Wênesaz
Senac (Jean) – Helbestvan
Demir (Özlü) – Nivîskar
Selim (Turan) – Wênesaz
Adnan (Varınca) – Wênesaz
İhsan (Şurdum) – Wênesaz
Tanpınar (Ahmet Hamdi) – Helbestvan, nivîskar
Giacometti – Traşker
Goldmann (Lucien) – Ramanwerekî Marksparêz, civaknas
Hüseyin (Baş) Rojnameger
Küçük Atillâ (Bayraktar) – Wênesaz
Kuzgun (Acar) – Traşker
Sam Francis – Wênesazê amerîkayî
Foujita (Leonard) – Wênesazê japonî
Yüksel (Arslan) – Wênesaz
Dr. Fahri Koparel – Hekîm, Qanserolog

Kedros – Nivîskarê yewnanî
HABER – Traşkerê bi eslê xwe cihî
İzak (Kapuano) – Cihûyê tirk, matematîkzan
Beckett (Samuel) – Nivîskar
Lévy (Leopold) – Wênesaz
Fikret Muallâ – Wênesaz
Remzi (Raşa) – Wênesaz
Abidin (Dino) – Çandparêz, wênesaz